NÛÇEYÊN KURDÎ STANDARDÊN NAVNETEWEYÎ...

# BOTAN TIMES

EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

## “DAIŞ ÇI TÊ BER, YA DÎŞEWÎTINE YAN JÎ DIKUJE”

Beril Caymaz

### “Dema mirovek zikbirçî be hûn nikarin bi oldarîyê zikê wan têr bikin”

Beril Caymaz



### 21 yek rojnamegerên Meksîkayî bê ser û şûn in

RSF




### “Bi yewmîyeyên me torbeyek arvan nayê kirîn”

Gulistan Korban






23-29 Çile 2023

# EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

23-29 ÇILE 2023 • JIMAR 2 • SAL 1

BOTAN TIMES

NÛÇEYÊN KURDÎ STANDARDÊN NAVNETEWEYÎ...

**Xwedî**
Botan International Medya Ltd. Şti.

**Edîtor/Nûçegihan**
Gulistan Korban Rençber
Berîl Caymaz

**Edîtor**
Murat Bayram

**Wergêr**
Yonca Sarsilmaz

**Rûpelsazî**
Ridwan Xelîl

**Bergsazî**
GrafîKURD

www.botantimes.com

BOTAN INTERNATIONAL MEDYA LTD.

**Xwedî**
Murat Bayram

**Midûr**
Yonca Sarsilmaz

**Pispora Pêşdebirina Çavkanîyan**
Kubra Sagir

**Şêwirmendê Weşanê**
Omer Faruk Baran

www.botaninternational.com

EUROPEAN ENDOWMENT FOR DEMOCRACY

Fona Ewropayê ya Demokrasîyê piştgirîya Botan Internationalê dike.
Hemî berpirsiyarîya naveroka Botan Timesê li ser Şirketa Botan International Medya Limitedê ye.

BOTAN TIMES

BULTENA HAFTANÊ YA NÛÇEYAN



# NAVEROK


“DAIŞ çi tê ber, ya dîşewîtine yan jî bi çekan dikuje” ....... 4

“Şakiro û mûzîka elektro çi li hev tên!” ....... 6

Partiya Saadetê: Divê Kurdî bibe yek ji zimanên fermî yên Tirkiyeyê ....... 7

“Dema mirovek zikbirçî be hûn nikarin bi oldarîyê zikê wan têr bikin” ....... 9

Salome Cizrawî: Wext wextê bilezûbeziyê ye ....... 11

21 yek rojnamegerên Meksîkayî bê ser û şûn in ....... 13

Bi 10 pirsan hilbijartinên gîştî û yên serokomariyê ....... 14

Teza Akademîk: Kovarên kurdî yên dîjîtal di çi rewşê de ne? ....... 16

RSF: Li Îranê 55 rojnameger ji ber karê xwe hatine girtin ....... 18

Botan Timesa Heftane dest bi weşanê kir ....... 19


21 yek rojnamegerên Meksîkayî bê ser û şûn in ....... 20

“Bi yewmîyeyên me torbeyek arvan nayê kirîn” ....... 20

Her kes dixwazin bi min re bizewicin! ....... 22

# “DAIŞ çi tê ber, ya dîşewîtine yan jî bi çekan dikuje”

Beril Caymaz    Çile 28, 2023



*Rojekê em disa çûbûn zêvîyê. Me dit ku ji nişka ve dengên topa hat. Li alîyê malê me dûman radibû. Hinekan bang dikir û digot ‘Daîşê çi tê ber ya dîşewîtine yan jî bi çekan dikuje”*

*Navberên me û şerî bi qasî 10 km hebû. Em êdî dengên top û çekan radibûn û rûdiniştin. Em hînê şerî bibûn. Êvar dibû me ronahî ya malê digirt lê bi tirs bûn.*

Jineka ji Kobanîyê bi van gotinan behsa demên xwe yên dawiyê yên li bajarê xwe kir.

Bi sedan malbat, di sala 2014an de ji şerê Kobaniyê reviyane û xwe li Sirûcê girtine.

Jineka nexwest navê xwe eşkere bike ji Botan Timesê re got ka ew ‘çawa ji şer rêviya ye.’

Ew jin bi 5 zarokên xwe re di taxên kevn ên Sirûcê, xaniyekê bi hewşeka pîçûk û du ode de dijî.



## Ez pêxas reviyam

*Me kuncî çandibû, ew qas pir bû ku me 40 roja çandinî kirîbû. Ez û zarokên xwe sibê heta êvarî bi cilê gemarî nav kuncîyan bûn.*

*“Em li zeviya kuncîyan bûn. Bi hatina DAIŞê, min pêxas zarokên xwe girt û erebeyê siwar kir. Ne cil ne pêlav tiştekî me tunnebû bi tenê ew cilên gemarî dûr ve ketin”*

*Gotin sînorê Tirkiyeyê vekirî ye her kes derbas dibe. Min li vir malê bavê xwe jî dit. Eskeran pêl têlê kir em derbas bûn.*

## Em bi şîn û girî veqetîyan

Xelkê Kobanîyê yên ji ber DAIŞê reviyane û hatine ;Sirûcê

*Zilamekê em erebeyê xwe siwar kirin. Em çûne gundekî Sirûcê lê ew jî nezikê Kobanî bû. Em çend rojan li wir man. Paşê em çûn navbera Riha û Sirûcê kampekê bi cih bûn.*

*6 salan ez û zarokên xwe li wir bûn, wexta kamp rakirin em bi şîn û girî veqetîyan.*

*Kesî min ê bişixule tinne bû. Min dest bişixulî kir. Zarîyên min niha diçin mektebê, ez jî diçim karê zêvîyê dikim. Em pembû, sîr û pîvazan berhev dikin. Ez ji xwe re vê qulikê de dewra xwe dikim.*



Xelkê Kobanîyê yên ji ber DAIŞê reviyane û hatine ;Sirûcê

# "Şakiro û mûzîka elektro çi li hev tên!"

Murat Bayram   Çile 27, 2023



Harun Eyup Polat

Harun Eyup Polat mûzîsyenekê ciwan e ku berhemên mûzîka elektro çêdike. Ew li zanîngehê li beşa teknolojiyên mûzîkê dixwîne. Li pey evîna xwe ya mûzîkê çûye Amerîkaya Başûrê û li kolanan li bilûrê daye. Li ser mûzîka xwe bersiva pirsên Botan Timesê da.

**Tesedif çêbû!**

*Şakiro & Emro [Remix]*
*https://youtu.be/uG9xyCVonyU*

> *7-8 sal in ku ez bi awayekê profesyonel berhemên elektro-mûzîk yên bi tarza serbixwe(indie) çêdikim. Rojekê li ser berhemeka xwe dixebitîm. Hingê ji aliyekê ve min ji xwe re stran vekiribûn. Dema mûzîka min û Şakiro bi hev re lê da.*
> *Min ji xwe re got Şakiro û mûzîka elektronîk çi li hev tên. Min hingê dest pê kir ku mûzîka xwe û stranên dengbêjan bi hev re bikim remiks.*
>
> *Harun Eyup Polat*

**Bilûrjenekê kurd li kolanên Amerîkaya Başûr**

*Şakiro & Lê Lê Qazê [Remix]*
*https://youtu.be/oSh1l2kRPNA*

> *Ez bixwe bilûrjen im. Hej meqamên kurdî dikim û wan bi awayekê profesyonel lê didim û çêdikim jî. Ez çûm Amerîkaya Başûr. Min sê mehan li kolanan li bilûrê da. Min meqamên kurdî li kolanên bajaran lê da.*
> *Xeyala min e ku bi mûzîka xwe çîrokên dengbêjan bi deng û dîmenan pêşkêş bikim.*
>
> *Harun Eyup Polat*

*Şakiro & Helîma Xwe [Remix]*
*https://youtu.be/V61EpJ90t0I*

# Partiya Saadetê: Divê Kurdî bibe yek ji zimanên fermî yên Tirkiyeyê

Gulistan Korban Çile 26, 2023




Tirkiye êdî ket pêvajoya hilbijiartinê.

Serokomarê Tirkiyeyê  Recep Tayîp Erdogan, hefteya borî dîyar kir ku wê hilbijartin di 14ê Gulanê de çêbibe.

Partiyên li Tirkîyeyê jî ji niha de dest bi kar û xebatên xwe kirin.

Dengê hilbijêrên Kurd jî wekî gelek hilbijartinan di vê hilbijartinê de jî biqiymet û stratejîk e.

Partiyên sîyasî ji bo Kurdan çi waat dike û dê çi bikin? Bernameyên xwe de çawa cîh didin Kurdan?

Li ser vê mijarê em ê her hefte li deriyek partiyeke siyasî ya li bajarê Amedê bidin.

Di hefteya yekem de em bûn mevanê Partiya Saadetê.

**Serokê Partiya Saadetê ya bajarê Amedê Abdurahman Ergînî li ser vê mijarê bersiva pirsên Botan Timesê dide.**

> *"Divê di serî de di çareseriya pisgirêka Kurd de hûn samîmî bin. Ger samîmîyet tûne be ji xwe hûn bi ser nakevin. Wekî ku AKP bi ser neket. Tenê ji bo dengê partiya xwe zêde bike dest avêt vê mijarê."*
>
> *Abdurahman Ergîn*

**Hûn dikarin bi erebî û îngîlîzî xizmeta tendurîstî bigrin lê…**

> *Welatiyên li vir dijîn herî zedê di warê ziman de pirsgirêk dikişînin. Mîrov dixwazin bi zimanê xwe yê dayikê qiymet bibînin. Divê zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdehiyê. Yanî qiymet*

*bibîne, piştre li hemû saziyên dewletê bê axaftin. Mînak hûn dikarin bi erebî û îngîlîzî xizmeta tendurîstiyê bigrin lê hûn nekarin bi zimanê kurdî bigirin ev ne neheqî ye? Em ê astengiya li pêş vê tiştê rakin.*

*Abdurahman Ergîn*

Li gor Abdurahman Erginî pirsgirêka Kurd ne tenê pirsgirêka leşkeriye û divê di zagonê de jî mafê hemwelatîbûna wek hev bi asayeki resmî bê dîyar kirin.

Erginî ani ziman ku li herêmê pirsgirêkên bêkariyê jî di asteke bilind de ye û ji bo çareseriya bêkariyê jî wê ji bo ciwanan hîn projeyên wan hebe.

Serokê Partiya Saadetê ya bajarê Amedê dîyar dike ku ew di hijartinên bê de talîbê dengê kurdan in.

Meclîsa Tirkîyeyê bi 600 kursî ye û di halê hazir de bi tenê 1 wekîlê Partîya Saadetê heye.

Partî di sala 2001an de bi pêşengiya Necmettin Erbakan hat avakirin û partiyeke rastgir e.

Ji sala 2016an vir ve serokatiya partiyê Kemal Karamollaoglu dike.





# “Dema mirovek zikbirçî be hûn nikarin bi oldarîyê zikê wan têr bikin”

Beril Caymaz    Çile 26, 2023



Ensarî Caymaz dema muezînek bû, bi rêya hevalekê xwe pê hesa ku li Efrîqayê pêdivî bi mamostatiya Quranê heye. Di zarokatiyê de yek ji xeyalên wî ew bû ku rojekê biçe Efrîqayê. Wî valîzê xwe hilda û ji Sirûcê çû Efrîqayê.



Di serî de malbata Ensarî qebûl nekirîye  û digotine “ tê ji birçîna bimirî, bitalûke ye” lê wê tevî bertakan jî çûye.

Sedema Ensarî di serî de bi piranî hînkirina quranê bûye û  wî 3 salan dersê Quranê daye, paşê  fikirîye ku bêtir dikare çi bike.

*Min fêhm kir ku hiyerarşiya hewcedariyên mirovan hene. Dema mirovek zikbirçî be hûn nikarin bi oldarîyê zikê wan têr bikin.*

**Li vir pir hêsan e ku mirov ola xwe biguherîne, ger ez bîbêjim 'ez ê ji we ra alîkariyê bînim hun jî ola xwe biguhêrînîn' her kes dîkarê biguhêrîne lê ev ne exlaqî ye.**

**Tişta ku Ensarî herî zêde jê acîz bûye û dixwest bi qasî ku ji destê vî were tune bike 'Ruhê kolêtiyê' ye.**

*"Erê êdî kes ji van kesan re nabêje kole lê ew kes hîn jî bi wê çanda koletiyê dijîn. Dema ku ez nû hatim Afrîqayê mirovên li vir ji min re digotin 'boss' (Patron). Ev gotin jî rewşa xemgîn bi kurtî tîne ziman. Li herêma ku lê dijîm min bawerîya berê hinekê şikandiye. Êdî dizanin ku 'kesê spî ' kesên normal in."*

**Tiştê ku Ensarî, matmayî bûyî ew bûye ku ew kes bi xeletî têne nîşandan.**

*"Her kes dîbêje xeter e. Nefsbicûk in, tevî hemû tunebûna xwe hewl didin ku mêvandarîyan xerîban bikin."*

*Pir dişibin Kurdan, loma ku ew zû adapte bûm.  Nefsbicûk in, tevî hemû tunebûna xwe hewl didin ku mêvandarîyan xerîban bikin. Li vir Sîstema Kabîleya heye mîna Eşîrî lê qaîdeyên xwe tundtir e. "*

*"Dema kurd dîzewicin bi taybetî welate min li Sirûcê malê bûkê pir zêr dîxwazin û li vir jî bi du ga didin dizewicin."*

Gelek kes hene ku dizwazin alîkariya mirovên vir bikîn, ser medyaya civakî ji Ensarî re dinivîsîn ji ber vê yekê ji bo zarokan gelek proje çêkirine û ev proje yekem in li vir.

*"Ev projeyên pêşî gelek şîrîn in, wek minaj cara yekem di belavkirina hamburger de zarokan ji hev cuda tomato, goşt û nan dixwarin. Me bi fêrî xwarinan wa kiribû."*

*"Jiyana li gundan pir hêsan e, binesaziya elektrîkê tune ye, mirov ji panelên rojê sûdê werdigirinn.Roj navenda jiyana wan da ye. Hema ku roj derdikeve diçin zeviyê ji ber zeviyê makîne tune ye mirov bi destên xwe pêş ve diçin. Dema roj diçe ava jiyan disekine her kes vedigere mala xwe."*











# Salome Cizrawî: Wext wextê bilezûbeziyê ye

Murat Bayram    Çile 26, 2023




Salome Cizrawî, Hewraman (Wêne: Azad Turan)

Jimara blogên çalak ên kurdî kêm dibin lê yek ji blogên kurdî, bloga Salome Cizrawîyê ji sala 2018ê ve çalak e.

Blog wek malpereka naverok-dewlemend weşana xwe dike. Li ser kêmbûna blog-malperan Cizrawîyê bersiva pirsên Botan Timesê da:

> *Ez bawer dikim, herkes di nava geremola jiyanê de heliya -wenda bû. Berê hin blogên Kurdî hebûn min ew dixwendin, dişopandin. Aniha deng ji kesî dernayê. Xwezî hejmara wan blogan zêdetir bûyana.*
>
> *Ez ji dil ve dixwazim hejmara jinên bloger ên bi kurdî dinivîsin zêde bibin. Ez dixwazim hemû cudahiyên wan û mijarên rengcihê yên ku ew li ser dinivîsin bixwînim û tecrubeyên wan ên takekesî bixwînim.*
>
> *Salome Cizrawî*




Blog-malpera Salome Cizrawîyê


Salome Cizrawî

## Ez ê berdewam kurdî nivîsim

*Ez van deman hewl didim da li ser resimê tiştine bînim pê her welê xwe pêş ve bibim, ez di ber re hem kitêban dixwînim hem jî min dest pê kir, ez li flûtê dixim.*

*Herçend ez malbata xwe û cîranan eciz bikim jî, ez hewl didim da ez bikarim lê dim.*

*Ez hewl didim kurdiya xwe pêş ve bibim. Carina ez di nivîsên xwe de xeletiyan dikim û hingê hevaline bi awayekî hişk rexneyan li min dikin. Herçend ez xelet binivîsim jî ez dê nivîsandinê berdewam bikim.*

*Salome Cizrawî*

## Hînbûn min keyfxweş dike

*Dibe ku ev gotin bi te klasîk were, lê wextê ez tiştekî nû hîn dibim û pêk tînim, hingê ez kêfxweş dibim. Wextê ez ji bo însên yan jî heywên bikêrhatî bim, kêfa min dibe bêdawîn. Ez dikarim bi gelekî tiştên biçûk dilxweş bim. Ji bo xemgînbûnê bi dehan sedem hene. Ez naxwazim li ser vê yekê salûxê bidim. Xwedê dizane ya girîng ew e meriv li hember jînê bizanibe da meriv ê çawa li têbikoşe.*

*Salome Cizrawî*

## Xwe pê gihandina zanîn û agahiyê divê mafê herkesî be

*Blog hem ji bo nivîsandinê hem jî ji bo beralîkirina parvekirina fikir, tecrube û xebatên şexsî navendeke guncan e. Ji ber ku di vê demê de însan dixwazin berî her tiştî -makale, nivîsên akademîk- xwe bi kurtenotan bigihînin. Wext wextê bilezûbeziyê ye. Ji bo min bi awayekî înteraktîf kitêb parve kirin, nivîsweşandin gelekî hêsan e. Xwe pê gihandina zanîn û agahiyê divê mafê herkesî be.*

*Salome Cizrawî*

## Dixwazim li hespa xwe ya kihêl siwar bibim

*Berî niha bi çendekê ez bi hevalekî xwe re li ser vê yekê dipeyivîm. Lê çi mixabin ku me hest pê kir em êdî nikarin xeyala vê yekê jî pêk bînin. Şert û mercên heyî bi xwe re hinek problemên civakî-aborî û psîkolojîk tîne, ev yek dibe sedemê realîsttevgerandinê. Lê ez dixwazim rojekê pêş de welatê min ava bibe û ez di nava axa xwe de li hespa xwe ya kihêl siwar bibim û wê di nava zozanên welatê xwe de bigerînim.*

*Salome Cizrawî*

# 21 yek rojnamegerên Meksîkayî bê ser û şûn in

Yonca Sarsilmaz Çile 25, 2023







Wêne: Yuri Cortéz / RSF

**Lîsteya rojnamegerên Meksîkî ku di 15 salan de berze bûne:**

1: Jesús Mejía Lechuga, 10/07/2003
2: José Alfredo Jiménez Mota, 02/04/2005
3: Rafael Ortiz Martínez, 08/07/2006
4: José Antonio García Apac, 20/11/2006
5: Rodolfo Rincón Taracena, 20/01/2007
6: Gerardo Paredes, 10/05/2007
7: Gamaliel López, 10/05/2007
8: Mauricio Estrada Zamora, 12/02/2008
9: María Esther Aguilar Cansimbe, 11/11/2009
10: Miguel Ángel Domínguez Zamora, 01/03/2010
11: Ramón Ángeles Zalpa, 06/04/2010
12: Evaristo Ortega Zarate, 20/04/2010
13: Marco Antonio López, 07/06/2011
14: Manuel Figueroa Fonseca Hernández, 22/09/2011
15: Federico Manuel García, 14/05/2012
16: Zane Plemmons, 21/06/2012
17: Miguel Morales Estrada, 19/07/2012
18: Adela Jazmín Alcaráz López, 26/10/2012
19: Sergio Landa Rosado, 22/01/2013
20: Mario Alberto Crespo Ayón, 07/12/2014
21: Agustín Silva Vázquez, 21/01/2018

Di sala 2022an de rojnameger herî zêde li der dora Meksîka û Haîtîyê hatine kuştin.

Di gel ku ne çihê şerê ye jî, ji bo rojnamegeran cihê herî xeternak Amerîkaya Latîn e.

Li gor nûçeya Reutersê li Berfanbara (Kanûna Pêşiyê) 2022an de rojnamegerê ji Haîtîyê Francklin Tamar ji alîyê du kesan ve hatiye kuştin.

Di bîst salên dawîyê de zêdetirî 1668 rojnameger li seranserê cîhanê hatine kuştin.


Kategorîzekirina giştî a kuştinên li dijî rohnamegeran zehmet e, lê zanyarîyeke berbiçav heye ku ev ji ber karên xwe tên kuştin.

Her wiha xalek eceb heye ku temenê wan rojnamgerên hatine kuştin di navbera 30-40î de ye.

> *Ev nûçe ji alîyê Yonca Sarsilmazê ve hatiye berhevkirin*

# Bi 10 pirsan hilbijartinên gîştî û yên serokomariyê

Yonca Sarsilmaz  Çile 25, 2023



Serokomarê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan ji bo Hilbijartina Serokomariyê û Hilbijartina Giştî 14ê Gulanê îşaret kir.

Pîştî axaftina Erdoganî, mijarên wekî biryara hilbijartinê kengê û wê çawan bê dayin, pêvajoya hilbijartinê, guherînên di qanuna hilbijartinê de wê çawa têkeve meriyetê ji niha de tê nîqaş kirin.

*Bersiva 10 pirsên tên meraq kirin:*

**1- Biryara dubarekirina hilbijartinê çawa tê dayin?**

Li gorî xala 116an a Destûra Bingehîn, Parlamentoya Tirkiyeyê, dikare bi piraniya dengan biryara nûkirina hilbijartinê bide. Her wiha mafê serokomarî/ê jî heye ku biryara nûkirina hilbijartinan bide.

**2- Piştî çend rojan biryara dubarekirina hilbijartinê tê dayîn?**

Ger biryara nûkirina hilbijartinan bê dayîn, dîvê biryar di nava 48 saetan de di rojnameya fermî de bê weşandin û pîştî wê divê di nava 60 rojan de hilbijartin bê nûkirin.

**3- Heger biryara nûkirina hilbijartinan were standin, gelo erkê serokomarê niha dê berdewam be?**

Qanûna Hilbijartina Serokomariyê dibêje: "Di rewşên ku dema wezîfeya Serokomarî bi dawî bibe yan jî biryara nûkirina hilbijartinan were dayîn an jî hilbijartin neyê temamkirin." Wezîfeya Serokomarê heyî heta ku yê nû dest bi wezîfeyê bike wê bidome."

**4 – Guherînên di qanûnên hilbijartinan de tê kirin kengê dikeve merîyetê?**

Guhertinên di qanûnên hilbijartinê de tên kirin, di hilbijartinên ku ji roja ketina meriyetê di nava salekê de bên kirin de nayên tetbîqkirin.

**5- Di cîbicîkirina guhertina di yasaya hilbijartinan de "roja destpêkirina hilbijartinê" yan "roja dengdanê" ji bo heyama salekê wek bingeh tê girtin?**

Li gor biryarê YSKyê hesab dê li ser "roja dengdanê" be.

**6- Piştî biryara hilbijartinê li YSK'ê dê pêvajo çawa bimeşe?**

Piştî ku biryara roja hilbijartinê hat dayîn, YSK dê salnameya Hilbijartina Serokomariyê û Hilbijartina Serdema 28emîn a parlementoyê diyar bike û roja destpêkirina hilbijartinê eşkere bike.

**7- Heger di dengdana yekem a hilbijartinên serokomariyê de piraniya dengan neyê bi dest xistin , dengdana duyem dê kengê were kirin?**

Heke piraniyek pêk neyê, hilbijêr dê roja Yekşema duyemîn a piştî vê dengdanê careke din biçin ser sindoqan. Her du namzetên ku di dengdana yekem de herî zêde dengan bi dest bixin dê beşdarî vê hilbijartinê bibin û namzedê ku piraniya dengên derbasdar bidest bixe jî dê bibe Serokomar.

Di rewşa ku tenê bi namzetekê deng were dayîn, dê dengdan bi rengê referandûmê bê kirin.

**8- Partiyên sîyasî ku tevlî hilbijartinan bûn bo wan dê hesabên bendeva hilbijartinan çawa bê kirin?**

Partiyên siyasî ji bo ku wekîlên xwe hilbijêrin, divê yan bi tena serê xwe benda hilbijartinê ya welat derbas bikin yan jî di nava tifaqekê de bin û tevahiya dengên vê tifaqê jî bendava ku li gorî dengên derbasdar hatiye diyarkirin derbas bikin.

**9- Li gor yasaya nû ya hilbijartinan, çend partiyên nav tifaqê dê wekî ku benda hilbijartinê derbas kirine bê hesibandin?**

Partiyên di tifaqê de ne neçar in ku ji sedî 7 cuda cuda derbas bikin. Dema ku tevahiya dengên hevpeymaniyê ji benda giştî ya ji sedî 7 derbas bike, dê hemû partiyên di nava tifaqê de wekî bendê derbas kiriye bê hesabandin.

**10- Hejmara wekîlên partiyên di tifaqê de dê çawa were hejmartin?**

Eger hejmara giştî ya dengan ji benda giştî derbas bibe, hejmara parlamenterên partiyên siyasî yên ku tifaqê pêk tînin, bi dabeşkirina hejmara giştî ya parlamenterên ku tifaqê wergirtine li gorî rêjeya dengên ku her partiyek wergirtiye, tê hejmartin.

Her çiqas Erdogan dîyar dike ku li hember namzetbûna wî tu astengên hiquqî tune be jî partiyên muxalefetê ne di wê fikrê de ne.

**Kadigîl: Erdogan nekara bibe namzet!**

Parlementera Partiya Karkerên Tirkiyeyê (TÎP) Serra Kadigîl, dîyar kiribû ku heta parlemento bi yek dengî biryara nûkirina hilbijiartinê nede Erdogan nekare bibe namzet.


Sera Kadıgil
@serakadigil · Follow

Seçim yenilenmesi kararı meclis çoğunluğuyla alınmadığı müddetçe Erdoğan hukuken ADAY OLAMAZ.

Seçimin yenilenmesi kararını Meclis'in alması bir "memnuniyet" vesilesi değil RTE'nin aday olabilmesi için ANAYASAL BİR ZORUNLULUKTUR.

Cumhurbaşkanı göz göre göre Anayasayı çiğneyemez.

Gerçek Gündem @gercekgundem
#SonDakika Erdoğan: 'Mecliste gereken çoğunluğun sağlanamaması halinde, seçimlerin 14 Mayıs'ta yapılabilmesini temin edecek bir takvimle kararımızı alıp süreci başlatacağız'
gercekgundem.com/siyaset/erdoga...

7:18 PM · Jan 23, 2023

5.4K Reply Copy link

Read 130 replies

Hevserokê berê yê HDPê Selehatîn Demîrtaş jî li hember namzetbûna Erdogan li ser hesabê xwe yê Twîtterê peyamake belavkir û got " Erdogan cara seyem nekare bibe namzet ev yek li dijî hiquqê ye."


Selahattin Demirtaş
@hdpdemirtas · Follow

Erdoğan hem diploması olmadığı için hem de olsa bile üçüncü kez cumhurbaşkanı olamayacağından, adaylığı yasaya aykırı ve gayrı meşrudur.

Yüksek Seçim Kurulunun Erdoğan'ın adaylığını kabul etmesi bu gerçeği değiştirmez. Sadece, Yüksek Seçim Kurulu bir suça daha ortak olur.

1/2


4:42 PM · Jan 24, 2023

20.8K Reply Copy link

Read 649 replies

# Teza Akademîk: Kovarên kurdî yên dîjîtal di çi rewşê de ne?

Murat Bayram    Çile 24, 2023




> *Kovarên dîjîtal ên kurdan yên li Tirkiyeyê bi şêweyî hebûn û karkirina xwe dişibin hev.*
>
> *Leyla Ozkaplan*


Akademîsyen Leyla Ozkaplanê bi van gotinan bi kurtasî behsa kovargerîya ji bo kovarên dîjîtal kir.

Wê li ser teza xwe ya bi navê "Bi nêrîna medyaya alternatîf, kovargerîya ji bo kovarên dîjîtal yên çand û hunerê" bersiva pirsên Botan Timesê da.

**Medyaya kurdan medyayeka alternatîf e?**

Ozkaplanê diyar kir ku medyaya alternatîf ew medya ye ku cih dide kes û mijarên "weşana ji bo girseya giştî (mainstream)" cih nade wan.

> *Di vê çerçoveyê de medyayeka kurdan ne ew medya ye ku "weşana ji bo girseya giştî" dike. Dema em li kovarên dîjîtal ên çand û hunerê jî dinêrin tişta hevpar ew e ku bi dildarî hatine avakirin. Her yek dema behsa sebeba hebûna xwe dikin behsê dikin*



T.C.
GALATASARAY ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
RADYO, TELEVİZYON VE SİNEMA ANABİLİM DALI

ALTERNATİF MEDYA YAKLAŞIMIYLA KÜRTÇE DİJİTAL KÜLTÜR-SANAT DERGİCİLİĞİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

Leyla ÖZKAPLAN

Tez Danışmanı: Doçent Dr. Ceren SÖZERİ ÖZDAL

HAZİRAN 2022



Leyla Ozkaplan

ku bi zimanê kurdî di wê qadê de ti berhem nînin an jî kêm in. Yanî ji bo temamkirina kêmayîyekê ketine ser rêyê.

Ji ber medyaya kurdan a li Tirkiyeyê li hemberî medyaya giştî wek medyayeka alternatif kar dike em nikarin behsa wê yekê bikin ku ew "weşana ji bo girseya giştî (mainstream)" dikin. Û xwendevanên medyaya kurdî jî kurdî-xwîn in, ew bi xwe ne girseya giştî ne.

Birêvebiriya kovaran ne hîyerarşîk e. Kesên dildar kar dikin. Kar bi hev re û bi yeksanîyê têne kirin. Ev ji aliyekê ve rewşeka pozîtîf e lê ji aliyê dî ve ji bo "domdarîyê" ne rewşeka baş e. Piraniya kovarên çand û hunerê yên dîjîtal sê mehane an jî şeş mehane kar dikin.



# RSF: Li Îranê 55 rojnameger ji ber karê xwe hatine girtin

RSF | RSF | Murat Bayram | Çile 23, 2023



Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas (RSF) ragihandiye ku Komara Îslamî ya Îranê 3 jinên rojnameger ên dî jî girtine.

Bi vê yekê hejmara jinên rojnameger ên girtî bûye 16. Ji destpêka xwenîşandanên Jîna Emînîyê ve, yanî ji meha Îlonê ve heta niho 55 rojnameger ji ber xebatên medyayê hatine girtin.

Ji van rojnamevanan 27 kes di girtîgehê de ne, yên dî jî bi şert hatine berdan û li benda cezayê xwe ne.

**RSF bang li rayedarên Îranê dike ku demildest rojnamegerên girtî serbest berdin û hemû sûcên derbarê wan de betal bikin.**

Melîke Haşimî ya ku ji bo Shahr News Agency kar dikir, li ser gazîkirinê 21ê Kanûna Paşiyê çûye Girtîgeha Evînê. Ew der bi naveke xerab navdar e. Paşê 22yê Kanûna Paşiyê jî **Mehrnoush Zarei** û **Saeede Shafiei** çûne. 48 seetan agahî ji wan nehatiye standin.

RSF
REPORTERS WITHOUT BORDERS

# Botan Timesa Heftane dest bi weşanê kir

Botan Times    Çile 23, 2023

Botan Timesê yekem jimara kovara xwe ya dîjîtal weşand. Kovar ji nûçe û nivîsên taybet ên hefteyekê yên Botan Timesê pêk tê.

Botan Times plan dike paşê weşana xwe ya kovarê berfireh bike lê vê gavê kovar wek berhemeka ji berhevkarîya nûçeyên malperê pêk hatî ye.

Hûn dikarin kovarê belaş bar bikin û bixwînin.



# “Bi yewmîyeyên me torbeyek arvan nayê kirîn”

Gulistan Korban  Çile 23, 2023



> *“Karê me gelek bi tahlûke ye lê bi yêmîyeya me torbeyek arvan jî nayê kirîn.”*
>
> *Mehmet Kurt*

Mehmet Kurt cîwanekî 25 salî ye. 7 sal in di înşaatan de karê kalibê dike. Di van rojan de  gelek bihêrs û gazinc e.

Ew dîyar dike ku êdî bi heqdestê wan tiştek nayê û daxwaza heqê xwe dike.

Bilindbûna buhayên xwarin û vexwarinê tesîr li ser her beşên karî yê li Tirkiyeyê kiriye.

Karkerên înşatê jî ji wan beşan yek e.

Li gorî lêkolîna Sendîkaya Kamu-Îşê, sînorê birçîbûna malbateke 4 kesî derketiye 9 hezar û 796 lîrayan, sînorê xizaniyê jî bûye 26 hezar û 994 lîre.



Mehmet Kurt

Di sînorê xizaniyê de di sala dawîn de zêdebûn 11 hezar û 982 lire ye.

Karkerên ku di înşaatan de dixebitin jî dibin sînorê xizaniyê de hewîldidin jîyana xwe bîdomînin.

**"Em bi mirinê re rûbirû dixebitin"**

> *"Sala borî me 300 lira digirt niha em 350 lîra digrin. Ji me tu kes nikare mîna berê bi yewmiyeyên heyî debara mala xwe bike. Êdî em bi zemên heyî re nagihijin."*
>
> *Zulkuf Batibay*

Batibay xwedî 4 zarokan e û 17 sal in dî înşaaten de dixebite.

Ew xwe wekî karkerên demsalî bi navdike û dibêje;

> *"Havînê kar heye zivistanê nîn e. Gelek înşaat sigortayên me çênake. Yen çêdikin jî pîrîmê wê kêm dîde. Yek ji sektora herî birîsk jî înşaete lê ne betlaneyên me yên biheq û ne jî mafên me yên civakî hene. Em bi mirinê re rûbirû dixebitin."*

Li gorî daneyên Rêxistina Xebatê ya Navneteweyî (ILO) li cîhanê di her 15 saniyeyan de karkerek di encama qezayeke kar de dimire.

Karkerên ku nekarin êdî bi pereyên kem bi xebitin bi daxwaza zedebûna heqdestên xwe li Qada Şexsedîa Amedê hatin gel hev û dest bi grevê kirin.

> *"Mûçeyên me bi têrî heqê ard, rûn, şekir û rê nakin. Lewma jî divê bihayê herî kêm ê yewmiyeyên me bibe 600 TL."*
>
> *Karkerên înşaatê*

Karkeran dîyar kirin ku heta ku yewmîyeyên wan nebin 600 lîra ew ê neçin ser kar.

Li Tirkiyeyê ji her 280 qezayên kar de di qezayekê de karkerek dimire.



Zûlkuf Batbay







Qada Şex Saîdê çalakîya karkeran

# Her kes dixwazin bi min re bizewicin!

Murat Bayram    Çile 23, 2023




**Nêrîna Jinan**

Hêja Netirkê di hevpeyvîneke de ji Botan Timesê re diyar kir ku vê hefteyê albûmeka wê ya bi şêweyê tekane (single) dê derbikeve.

Navê albûma wê ya nû "Herkes Zewicî" ye.

> *Ez dixwazim hestên jinan bibêjim. Yanî ji aliyê jinan ve behsa hin meseleyan bikim. Mesela we gelek caran bihîstiye ku mêrek ji jinekê re bibêje "herkes zewicîn ka em jî bizewicin." Lê min xwest vê yekê ne mêrek lê jinek bibêje.*
>
> *Hêja Netirk*




Sobe – Hêja Netirk

## Nikarim vegerim

> *Ez nafikirim bizewicim. Lê her kes dixwazin bi min re bizewicin! Ma her kes dizewicin? Na!*
>
> *Ez karê xwe yê hûnerî didomînim û nikarim ji Almanyayê vegerim. Ya rastî ez miroveka komîk im lê dewlet (Tirkiye) dixwaze min bavêje di girtîgehê de.*
>
> *Ez gelekê hej jinên ji-xwe-bawer dikim. Ew jî gelekê hej min dikin. Bila silavên min li jinên jixwebawer bin.*
>
> *Hêja Netirk*

## Çîroka destpêkirinê

Hêja Netirkê di hevpeyvînekê de bi Botan Timesê re li ser çîroka destpê kirina mûzîka xwe axivîbû:

> *Min ji strangotinê pir hez dikir. Ji zaroktî de her cara ku derfet çêdibû min stran digotin. Li zaningehê min dest bi kluba folklorê kir, wek hobî.*
>
> *Ez ketim beşa dansê ewil. Lê dans ne li gor min bû. Dema em hînî dansên Balkanî dibûn, ji min re pirr dijwar dihat.*
>
> *Ez li mehna digeriyam ku dev ji Kluba folklorê berdim. Hevalekî stranbêj ji min re got tu 'ji bo çi nayê beşa strangotinê, dengê te xweş e', min got 'te nebihîstiye ez çawa stranan dibêjim, tu ji ku dizanî dengê min xweş e', wî jî got ji axaftinê diyar e.*
>
> *Werhasil min ji bo sê salan dersên stranbêjiyê standin. Ya rast min dixwest ez xwe fêrî lîstikvaniyê jî bikim bes dersên lîstikvaniyê û stranbêjiyê di heman demê de bûn. Helbet me li wir hertim stranên gelerî digotin.*
>
> *Dema ez ketim hepsê, ez fêrî gitarê bûm. Û min stranên xwe yên ewil çêkirin. Piştî ez derketim jî min biryar da ku ez stranên xwe qeyd bikim.*
>
> *Kêfa min jê re tê ku stranên min di derbarê jiyana rojane de ne û hestên jinekê tînin ziman. Ez fikirîm, min got heger min jê hez kiribe, teqez wê kesên din jî jê hez bikin. Ji bo ku ez xwe bigihînim mirovan jî min medyaya civakî wek amûrekê bi kar anî, ev yek jî gelekî wext dixwaze.*
>
> *Hêja Netirk*